

Ji bo tevahiya dêûbavên, zarokên  
wan diçin kreşên Berlinê

12.10.2021

### Agahiyên ji bo dêûbavan

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

bi vê yekê em dixwazin di derbarê sererastkirinên nû yên di 3. SARS-CoV-Rêzicknameya Tedbîrên Parastina ji Enfeksiyonê (3. InfSchMV) de agahî bidin we, ku bi vî awayî ji bo beşa piştgiriya zarokan a danê rojê guherînên girîng pêk tînin.

#### Beşdariya Çalakiyan

Li gorî qanûnên 3. InfSchMV mafê rêvebirên saziyan û her wisa sazkerên çalakiyên, bo nimûne yên di beşa çand û sporê de, heye, ku ew bi serê xwe biryar bidin, ka ew destûrê didin tenê wan kesên, ku derzî li xwe xistine yan jî ji nexşeyê baş bûne (ango Şertê-2G) beşdarî çalakiyên wan bibin. **Ev şert ji bo xebata hêlîna zarokan derbas nabe. Ji bo zarokên ji 6 salî biçûktir Şertê-2G derbas nabe.** Ew dikarin bêyî testa negatîv a koronayê herin van sazî û çalakiyên, wekî bo nimûne şanoya zarokan. Ev rêbaz ji niha û pê ve her wisa ji bo zarokên hêlînên zarokan ên ji 6 salî mezintir jî derbas dibe, lê bi şertê ku ew li gorî çarçoweya sûdgirtina ji xizmeta hêlîna zarokan mecbûr bin bi awayekî bi rêkûpêk werin testkirin. Ji bo vê yekê Welatê Berlinê bi riya saziyên lîstikê zarokan a danê rojê kapasîteya testê ya bi rêkûpêk (hefteyê 2 caran) a ji bo testkirina zarokên diçin hêlînan saz dibe. Em ji we rica dikin, ku hûn ji vê derfeta testê sûdê bigirin, da ku tevahiya zarokên li hêlînan bikaribin beşdarî çalakiyên li derveyî hêlînê bibin.

### Rêbaza Xweîzolekirinê/Karantîna

Daîreyên Tenduristiyê kesên têkildar ên nêzîk, ku bi kesekî xwedî testa pozîtîv re têkilî danîne, û dirêjîya dema karantînaya wan li gorî pêşniyarên Enstîtuya Robert-Koch (RKI) diyar dike.

Bi şertê testkirina bi rêkûpêk a zarokên diçin hêlînan pêkan e, ku bi riya Testa Zû ya Antîjenê 5 roj piştî pêwendîya dawî peywira karantînayê biqede. Lê divê belê biryara li ser vê yekê li gorî şert û mercên Daîreya Tenduristiyê ya berpirsyar be. Em bi we didin zanîn, ku mirov nikare li mala xwe bi riya testa xweser peywireke karantînayê ya bi vî rengî biqedîne.

Hûn dikarin li ser vê malperê agahiyên berfirehtir ên li ser vê mijarê bibînin:

[www.rki.de/DE/Content/InfAZ/N/Neuartiges\\_Coronavirus/Kontaktperson/Management.html](http://www.rki.de/DE/Content/InfAZ/N/Neuartiges_Coronavirus/Kontaktperson/Management.html)

### Hînbûn

Em dixwazin bidin zanîn, ku şertê ligelmayîna dêûbavan a di dema hînbûnê de ew e, ku divê wan derzî li xwe dabe, ew ji nexweşiyê baş bûbin an jî testa xwe kiribin (ji bo vê yekê testeke zû têrê dike, ku li pêş nûnerekî diyarkirî yê hêlîna zarokan were kirin).

### Alîkariya Malbatan a Demkî

Em dixwazin bi dilxweşî dîsa agahî bidin we, ku Welatê Berlinê ji 4ê Çileyê 2021an û vir ve ji bo demên borî jî **Alîkariya Koronayê ya Demkî ya ji bo Malbatan** dide, ku li gorî § 45 Sozialgesetzbuch V (Qanûnnameya Civakî V) mafê wan ê girtina Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê tune ye. Ev yek ji bo kesên serbixwe, kesên kêr dixebitin, xwendekarên dixebitin derbas dibe, ku ji ber pandemiyê ew neçar mabûn li malê li zarokê/a xwe binêrin û ji ber vê yekê dahatûya wan kêr bûye. Ev kes dikarin hete dawîya salê li ser vê lînkê li jêr serî li vê yekê bidin:

<https://www.corona-hilfe-kind.berlin>

Agahiyên berfireh li ser malperên Rêveberîya Senatoyê ya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan û Rêveberîya Senatoya Fîransê û her wisa portala Berlinê ya ji bo malbatan in.

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya V – Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk